

KOLETÎ

DI DiROKA miletan de qonaxa koletiyê serdemê dîr û dirêj xayand demêki merite û mirovayeti gelekî azar û êşkence û sitem û sitemkarî kêşandin ji ber destê xoser û zordaran lê xebat û têkoşîna qata bidest û sitemdide nerawestiya lipênava azadiyê û gerden azadiyê da ko mirov û mirovayeti veşerin şewazê xweî xoriskî û suruşti lê iro roj di vî serdemî de em dibînin ko gelek mirov û rêxistinên siyasî yên kurdî bêriya ewî serdemî kirine û em dikarin bibêjin ko rêxistinek wek (pyd) koletî liser xwe sepaniye û pejirandiye weko rênber û dar û destê rijemê li ser serê gelê kurd li rojavayê kurdistanê bi şeweyekî bername kirî di çarçûveyê kêşedoza kurdî de .

Dengê kurd

L³

Koçberiya kurd ji rojava yê kurdistanê ji berjewendiya kê re ye ?

L²

Bandora berjewendiyên partîti li ser rewşa ragihandinê

L³

Rijem bo çareserkirina girûgiriftan naçare

Kêşedoza kurd û mîlmîlana siyasî li cinêv2



Kêşedoza kurd û mîlmîlana siyasî li cinêv2

Şêrwan Wardozî

Şoreşa suriyayê hemû pencere û dergeh vekirin li pêşiya pêşveçûn û çarçûveyên siyasî û wisa dijberiya liser pê û lingan û ya xewlîmaş û razayî hemû pêkve ketin qoş û cirîda xebat û têkoşîna hilêb û pêşbîn û karnameyên li ber dest û hêvî kirî , lê wekû têtê zimên ko keştî û ba lihev negunciyane linavrasta deryaya şoreşa ko bûye cengeke xwînrej û wêrankar , li wê navê dijberiya erebî gelek kongir û korband bestin û girêdan da ko çareseriyên ji ewan pirsgirêkên dîrokî û siyasî re peyda bikirin da ko gel û pêkhatên nijadxwaz bighêjin daxwaz û hêvî û armancên xwey rewadar û lêkhatî , lê her dem ew mebest bê hêvî dibû jiber ko berjewendiyên kesokî û alîgirî û regezperistî dadwerî pêşêldikirin di çareserkirinê de .

Lê tevgera rizgarîxwaza kurd dikarî



bû çend destkeftan tûmar bike li çend westgehên danûstan û giftûgoyan wekû pênasîn bi kêşedoza gelê kurd li rojavayê kurdistanê li cem civaka navnetwî û binav kirina çend zara-vsiyên siyasî û ya herî giring rêkev-

tina dîrokî dinavbera hevalbenda sûrî û encûmena niştîmanî kurdî de bi serperîştîya (partî) û wisa tevgera rizgarîxwaz dikarî bû xwe ligorî bûyer û qewmanan bi guncîne û siyaseta biragmatî bikarbîne liser rêçxanka tirêna

serdest û durust di rêbaza berjewendiyê gelê kurd de li rojava , lê îro roj kongireyê cinêv 2 li hêvî û çavlekîrinê ye di çarçoveyê danîna çareseriyêke tevwestî liser astê sazandina hemû layen û alîgirên şerxwaz û pevketî liser bingeh û armancên welatparêzî û hevvelatîni da ko ev cenga gûr û gurix raweste û aştî û hêminî û aramî û tenahî xweberdin sertaserî suriyaya wêran kirî û rapiskandin û rizgarkirina wê ji navlepê komerîşkên tekfîrî û berberî ve . Lê ya herî giring ewe ko berjewendiyên gelê kurd bêtin bidestxistin û tevgera rizgarîxwaz dikaribe rola xwey karîger bilîze liser astê hemû rehend û pêşbînî û mafkêşanan da ko ji kongire bê par nemîne û wisa serkeftinê bidest ve bîne da ko xebat û têkoşîn û xwîna pakrewanan bêhûde neçe û buhara kurdî gulistan û gulzaran bibişkivîne li havîneke berhemdar .



barzan hisên

Bandora berjewendiyên partîti li ser rewşa ragihandinê

Doza Ku ez Îro li ser gotubêj dikim ne dozeke siyasîye , lê xuyaye ku gihiştîye qonaxa çaksaziyê,ji ber ku hin hêzên ragihandinê rê nadin kesên pispor ku cihên xwe bigrin, jiber rola beşdariya ragihandinê di pêşveçûna civakê û di hemû warên jiyânê de , çî çandî,civakî,siyasî û her wiha jiber bizavên giring û peydakirina çareseriyên pêwîst jibo pêkanîna omîd û hêviyên di nameya ragihandinê de ,nemaze,em kurd di gelek nexweşiyên de derbas bûne,hêz û derfetên me hatine xemsar kirin, nivîskar,helbestvan û rewşenbîrên kurd ên hemû derfetên xwe xistin bin xizmeta doza kurdî de hatin binçav kirin , jiber vê yekî gelek jîwan bi navin biyanî nivîsîn pênûsa wan xebatkeran bû xetîre û ronî dida rêya gel û her weha jiber rola ragihandinê rojev a giring di çalakkirina çerxa pêşveçûnê û pêşxistina hişmendiya şênî de, nemaze kenalên kurdî yên ku derketin holê

piştî guherînên herêmî û navnetewî li ser doza kurdî û ji ber pirsariyek girseyî li ser ragihandinê heye , çimkî ew derbirîne omîd û hêviyên gelane û navgîneke têkoşîneye, lewra ragihandinê azad rastî mebesta wêye û mijarekî şeweyê wê ye lewra pêwîste ku kenalên peykî û rojnemegeriya azad û partî yên kurd lêvegerîneke tekûz û çaksaziyên giştî pêkbîne di rêya ragihedîneke sîtratîjî de û bi pêşxistna naverok û xameya ragihandinê, divêt em guherîn û nûbûne kurde ne xasim piştî bihara erebî ya ku ez di binim wek bihara gelan Evgirêdayî ye bi peyda kirina vîna siyasîya rastî li gel biryrdarên ragihandinê bila em xwedî bawerî bin bi belavkirina xêr xwaziyê ji bo pêşerojek şên da ku em bidin zanîn ji dagîrkerên kurdistanê re ku gelê kurd bi rewşenbîr û siyastmedarên xwe dikarin û hêjayî serkidayetîya darê pêşketinê bikin û ev dibe alivê ji nifşekî ciwan û ne kesên ku xwe mijûl dikin di kar û barê navxweyî û derve jiber vê yekê divêt em der-

fetên afrandinê nemezixînin û dûrnexin ji ber ku ev dibe nakokiyek ji kadîrê rêveberîya partîtiyê re û ev dibe cihê na bawerî ye û metirsîne li gel berpîrsên kenalê yan rojnameyê,yan piştgirin rêklamî beriya ragihandinê jê di xwazîna Birastî ev kiryarên wiha wek şûrekî li ser ragihênerê ser bixwe û afrîner bi hest,pêşinyar û nêrinên xwe û ji bo çareserkirina aloziyan ne başe ev şeweyê wek şeweyên baasê faşîst ragihandinê wek pacyekêye tere bîner rewşa welêt dibîne divêt em wê bixin bin xizmeta gel de ji ber vê yekê ragihandinê azad pêwîste da ku em nekevin gûman û diyardeyên kevne şopîya rijîma dagîrkerên kurdistanê de divêt em li ser parçeyê rizgarkirî bisekinin mixabin ragihandinê tede di bin çavdêriya peywanên ku piştgirîya hin aliyên dikin ev diyarde cudahî û dûrkîne di navbera rola pêşengî ya ragihandinê di karê xwe ye sincî û pişesazî gelê kurdîtiyê çanda azadiyê de jiber vê yekê divêt sînorê partîtiyê were rakirin lewra divêt

em tev hewl bidin ku rêza ragihandinê bi hemû beşên wê bicihbikin ji ber ku bawerîya gelê kurd bi rizgarkirina wî ji rijîmên diktatorî û hişmendiya dest hilatî tê lewra her çiqas ew ji ezîtiya partîtiyê derkeve û ecende û xebatên cihên baweriyê û derbirîna azad peyda bike û tevli rewşa giştî bike ewqasî wê temeşevanên ekranên piçûk û xwendevanên rojnameyan zêde bibin wek mînak gelek kenalên peykî yên erebî û biyanî lîsr lîsta pişesazî wek al erabiya alcezîra BBC û rojnameya wek alheyata lendenî midilist û lomonda a ferensî û,,,,,hwd Da ku hêvî tekûz bibe di navbera derbirîna azad û kêf xweşî ji aliyê temaşevan ve û da ku ragihêner nebe qurbanî ji hêla wî kenalî divêt em ji navgînên ragihandinê re ramana azadî û rexnegîriyê bîr bixin di dawiyê de em gelê kurdî di vê jînê de mane bê par û li ser eniya me sitem û tarûmar hatiya nivîsandin,,,,, gelo kesek heye di hewara me de bê û vê rûpela reş biguhere bi rûpeleke nû ve.

Rijêm bo çare-serkirina girûgiriftan na-çare

şêrzad osman



Wekû hatiye gotin pêşekiya durust encama durust bidestve dixîne û jiber ko rijêma Esed sedemê hemû pîrisgirêkane ew nikare ti çareseriyên pêşkêşbike li kongireyê cinêva2 ji ber ko ew parçeyeke ji pîrisgirêkane eger ko ew ne pîrisgirêk û girûgirift bi xwe bin ,lewra rijêm giriftkêşe ne çarekêşe bi her şewaz û hawî di hemû hevsiyên siyasî de li bazara giftûgoyan û derkêşên alûgoran de çi li astê navxoyî de û çi li astê nav herêmi de bihûravî û gotrayî. -rojane rijêm bidehan kesêd tayen û bê guneh dikuje û bi sedan derbeder dike û bi hezaran tî û birçî dike û avahî û malan wêrandike li rastî alavên xwey leşkerî yên

wêrankar û têkder

- rijêma ku bidehên salan bûye sedem û egerê têkçûna jîn û jiyara gel û pêkhatên sûrî dixwaze dirêya hevalbendên xwe re cihê xwe di nava rêz û alîgir û komerîşkên siyasî de çêke û hokarên giftûgoyan bidest xwe ve bîne û wisa girûgiriftan diçespîne li nax û kûrahiya serhevde û mergesatên xwe yên dîrokî û mirovdarî li ser hemû ast û rehendên çarçûveya pêvajoya rojevê.

Li alîkî dîtir dijberiya Erebi Nedûrî ewan astengi û kospên ko rêgirin li ber rûber û gorepana çareseriyên ji ber ko hîna xwe Rizgar nekiriye ji paşmayê girêbend û paşhatên nejadperestî dêmekî da ko

serkeftî be divêtin azad û rizgar be ji ewan girûgirift û serhevdeyên kelemdar û astengdêr.

Tevgera rizgarîxwaza Kurd jî vexwendkiriye li ser ewan pîrisgirêkên serhevdekirî da ko bi guncîne li gorî bûyer û Qewmanên dîrokî û siyasî di Şoreşa Sûrî de ta ko xwestek û armancên kêşedoza kurd bi dest ve bîne bê nîgeranî û tirsan li hêlên sor yên ko bûne astengiyên çepokaş di rêveçûna pêşveçûnê de. Kongireyê cinêva2 derfeteke dîrokiye bo hemû pêkhat û alîgiran da ko karibin pêkve çareseriyên dinav hevde pevxin û tevxin li ser astê sazan û sazandinê û li hevkerina pêkvejiyarî.

Koçberiya kurd ji rojava yê kurdistanê ji berjewendiya kê re ye ?

Laleş Waşokanî



Bê goman koçberî rewşeke tevliheve di kawdanin têkçûyî ji hemû rasta û li ser rûberê hemû biyaf û astan ew karûbarê komkarî hest û hizreke payebilind di berpirisyariyê de diguncîne li himberî takekes û civakê bi giştî da ko nirxbuhayên kur-

dayetiyê serdest û serbest bêne girtin Li ser demê koçberiyê gelek nîrx-buha û nerît tene guhrtin dinavbera pêşêlkirina jînû jiyara xweriskî û têkçûna binaxeyên sincî û rêwîstên mirovî û civakî, dema ko mirov dibe şikara pêdivî û pêwîstiyên rojane li himberî motaciyên li jêr zefûtimesta

parastina jiyana kesokî û miqatebûna rêbirû rewîşt û nerîten oldarî û civakî û neteweyî. Li rojavayê kurdistanê helmetên koçberiyê destpêkirine ji destpêka berpabûna şoreşa sûryayê biberû welatên derawsê paşî ko jîn û jiyara wan ketiye metirsiya kêmasiyên jîngarî û hewildanên parastina ewlekariyê û tevnaqomelayetiyê kehkiçandin û piçirandin li çend derav û biyafan hatiye qetan-

dingin dibin zebrûz-enga kiryarên leşkerî û destdirêjyên komerîşkên çekdar yên tekfirî û berberî de li pênavê tehfîlkirina regezperestî û li jêr duruşmên xwedênasî û oldarî bi şewazekî hizdarî û binbirkarî -helmetên koçberiya kurd ji rojavayê kurdistanê çend alîgir tede berpiri-

syarin û hokarin wekû rijêm û dam û dezgehên xwey ewlekarî û komerîşkên regezperest û li rasteke dîtir(dahiş-nusre) û havalbendê herî mezin û gewre (pyd)û darûdestên xwey leşkerî Ūasayişgerî li pênavê zefûtimesta xak û zalgehên pişkininê, wa diyare ko rijêm û damûdezgehên xwey rêncbr û xulamok koçberî kirine rêbaz û karnameya siyasî da ko guherîneke dîmoxrafî pêkbinin li rojavayê kurdistanê da ko bi erebkerina devera kurdî tekûz û serrast bibe wekû hatibû nexşekirin û pîlandanin li ser demê (m-t hilal) ew pirojeyê ko hatiye naskirin binavê (zî-nara Erebi)

Lê lihimberî ewan helmetên dirinde û rûreş ka kurdî tevgera xwey rizgarîxwaz çi amadekirine jê re? yan çi jê re kirine ?Yan ka ewên çi bikin jê re? ew pîrisyarana balkêş û mendhoşin dimînin bê bersiv ligorepana siyasî jiber ko naçarî û nakokî serwerê helwêsta rojevê ne ?

Rêmejt dermane

kurte çirok

Hozan dêrşewî

Rojekê ji buharên çiyayê Gabar yê nêzî Cizîra Botan , roj diçû ava , gayê maleke gundê Dêrşew winda bû û venegeriya , xwedanê malê li der dora gund li gayê xwe geriya , şev reş bû û mamê reben bi çolan ket , piştî wesaneke dît ku ew zor dûrî gund ketiye û ji nêzîk ve dengê guran tê , bi lez û bez çû li ser dareke bilind li wê derê bû , gur li dora darê civiyan û zûrîna xwe her bilind dikirin û diranê xwe eşkere dikirin û bi hovane li mamê reben dineriyan , ji xwe re digotin me nêçîreke hêja li ser vê darê ditiye û dixwestin ku mamê gundi ji darê dakeve ta wî bixwin .Lê mam ji kurê çiya û deşt û newalan e , bi vê hesaniyê xwe radestî guran nake , ramanin di serê xwe de birin û anîn , mejiyê xwe yê temen westa , bikar anî û gehişt biryarekê , mam destê xwe birin kir û dilopên xwînê berdan li seranserî guran , bihna xwînê ji li guran derman bû , ji nişkêve van guran êrîşî hev kirin bi şerekî dijwar ku bîna xwînê ji hev kirin û nizanin birindar kanî , her gurekî ji xwe re digot ku gurê dî goşt xwariye , û hevdû gunehbar kirin , gur ji wir çûn piştî şerekî dijwar , û mam ji li ser wê darê rawestiyata beyanî , û hat mala xwe dît gayê wî ji vegehiya ye .



BELAVKIRINA BEHW- ERNAMEYÊN ZIMANÊ KURDÎ LI BAJAROKÊ (Kêşkê)

Dengê kurd

LI ROJA 1-11-2013 û li jêr duruşmê (ziman nasnameya gelane û zimanê kurdî nasnameya me ye) encûmena niştîmanî kurdî liqê kêşkê bi ser navenda nesredîn berhik ve ahenga derçûna nişke nû li

darxist û di nav re behwernameyên xulê fêrbûna zimanê kurdî hatin belavkirin li ser xwendekarên derçûyî ko hijmara wan gihiştî bû 150 xwendekarî ji herdû regezan kur û keç û li dv re behwernameyên

tîmarkaran hatin belavkirin li ser 100 derçûyên keç bi amadebûna cemawerekî berbiçav ji xizm û karên kêşkê bi beşdarbûna hemû çalakdariyên civakî û rewşenbîrî û siyasî .

Pilingên taykewandoya (hesekê) padaştên cîhanî bi dest ve anîn li turkiyayê

Dengê kurd

Xwendegha pilingên taykwando ji repelên hêzdar û ciwaze li bajarê hesekê ew repelê ku buhatirîn padaşt bi dest ve anîne li turkiyayê paşî vexwendineke fermî bo beşdarkirinê li qehremaniya ewê liska tirisnak û dijwar û padaştên ku bidestve anîne evin:

1- padašta çetirîn repel di qehremaniyê de

2- padašta çetirîn lîskvan(dilyar hisên)

3-mîdaliya zêrîn (ala hisên)

4- midaliya zivîn(nisrîn hisên)

5- çar midaliyên bironzî (mesûd abê-dilyar hisên-rojhat ehmed-aza hesen)

Têzanin ko bîst repelan di qehremaniyê de beşdarîkiribûn ji hemû dewletên rojhelatanavîn û oropayê.

